



## Li Tirkîyeyê du hefteyên dawîn (15-31ê Tebaxê, 2022)

### 17ê Tebaxê, 2022

#### **Kesê ku di konserê de bi qirîn got "Dengê xwe nede AKP'ê" hat binçavkirin**

Di çarçoveya 5emîn Lîstikên Piştevaniya Îslamî ya li Konyayê de kesekî bi navê M.O. mikrofon rahişt destê xwe û bi qirîn got, "Konya hişyar bibe, êdî dengê xwe nede AKP'ê". Serokê Şaxa Ciwanan a CHPê Kilik ragihand ku M.O bi lêdanê hatiye binçavkirin û piştî îfadeya wî di heman rojê de hatiye berdan.

#### **Zanîngeha Doguşê der barê xwendekarên xwe yê ku zemên li bihayê xwendinê protesto kirin de lêpîrsîna disîplînê da destpêkirin.**

Li Zanîngeha Doguşê, rêveberiya zanîngehê der barê hin xwendekarên xwe lêpîrsîna disîplînê da destpêkirin. Xwendekaran di 12ê Tebaxê de çalakîya protestoyê li dar xist, ji bo zemên li bihayê xwendinê nerazîbûn nîşan dan û daxwaz kirin ku zema ji sedî 300 paş ve bê vekişîn.

Rêveberiyên zanîngehan lêpîrsînên xwe li gorî Rêzîknameya Disîplînê ya Xwendekarên Saziyên Hîndekarîya Bilind dimeşînê. Cezayên ku li xwendekaran tên birîn ji cezayên hişyarî û şermazarkirinê dest pê dike, heta bidûrxistina xwendekaran a ji zanîngehê ya bo hefteyekê, mehekê, nîvsalekê an jî du nîvsalan diguhere. Di hin rewşan de têkilîya xwendekaran a ji saziya hîndekarîyê bi temamî tê qutkirin.

Cezayên bidûrxistinê di nav heyama hîndekarîyê ya xwendekaran de tê hesibandin, lewra heyama hîndekarîyê ya kesên ku ji bo nîvsalekê hatine bidûrxistin dirêj dibe. Zanîngehên taybet bursa xwendekarên ku cezayê disîplînê werdigire qut dikin. Xwendekar di heyamên ku tên bidûrxistin de nikarin têkevin îmtîhanan.

### 22ê Tebaxê, 2022

#### **Saziya Îlan û Çapemeniyê mafê rojnameya Evrenselê yê weşana reklam û îlanên fermî betal kir.**

Saziya Îlan û Çapemeniyê (BIK) ji ber biryara rawestandina îlanên fermî û reklaman ku di Îlona 2019an de hatibû girtin, mafê rojnameya Evrenselê yê weşandina reklam û îlanên fermî bi temamî betal kir. Saziya Îlan û Çapemeniyê jixwe ev 3 sal in îlan nedida rojnameya Evrenselê.

Midûrtiya Giştî ya BIKê ji bo sedema betalkirinê wisa ragihand ku xwînerên Evrenselê ji rojnameyekê zêdetir ji rojnamefiroşan dikirin. BIKê bi ser de wisa îdia kir ku rojnameya Evrenselê abonetiya sazîyan û lînûskên qeydê bi rêk û pêk nagire.

Rojnameya Evrenselê di daxuyanîya xwe de wisa ragihand ku BIKê agahî daye ku di 14 û 16ê Îlona 2019an de bi hêjmara firotinê ve peywendîdar li firoşgehan venêrîn pêk anîne û tespît kirine ku Evrensel şertê firotina herî kêr 4 hezar rojnameyan pêk nîne û xwînerên Evrenselê ji rojnameyekê zêdetir dikirin û bi vî rengî tîraja rojnameyê bilind dikin. BIKê di hejmara firotinê de cih neda rojnameyên ku bi abonetiya 13 rêxistinên bajar û navçeyên Partiya KEDê (EMEP) tên belavkirin.

Saziya Îlan û Çapemeniyê (BIK) ku di sala 1961an de bi zagona jimare 195an hatiye avakirin, belavkirina îlanên fermî li rojnameyan bi rê ve dibe. BIK saziyeke giştî ye ku di berdêla weşandina îlanên fermî de alîkariya aborî dide çapemeniyê. Ev ji bo hemû organên medyayê û bi taybetî ji çapemeniya herêmî çavkaniyek darayî ya pir girîng e. BIKê piştî Derbeya Leşkerî ya 1980an dayîna îlanên fermî ya rojnameyên hindikahiyan rawestandibû. Ev pêkanîna xwe spartibû xala duyemîn a benda 39an a rêzîknameya îlanên fermî û reklaman û weşanên demkî ku dê wan îlan û reklaman biweşînin. Di vê xalê de hatiye zelalkirin ku "divê rojname her cure nivîsan bi tirkî biweşînin"



Di sala 2011an de serokwezîrê wê demê Erdogan di şîveke fitarê ya bi civat û weqfên kêmneteweyan re soz dabû ku dê di rojnameyên kêmneteweyan de îlanê fermî bîn dan, lê ev vesazkirin pêk nehat. Li şûna wê, Saziya Îlan û Çapemeniyê biryar da ku "ji bo 6 rojnameyên (kêmnetewe) ku di bin şert û mercên giran de jiyana xwe ya weşanê didomînin, alîkariya pereyan bike".

### **23ê Tebaxê, 2022**

#### **Polîsan mudaxeleya Nobeta Edaletê ya malbata Şenyaşaran kir**

Polîsan hewl dan ku nobeta edaletê ya Emîne Şenyaşar û Ferît Şenyaşar asteng bikin. Di 14ê Hezîrana 2018an de li navçeya Pirsûsê ya Rihayê hevjin û 2 kurên Emîne Şenyaşarê ji aliyê cerdevan û xizmên Wekilê AKPê yê Rihayê Îbrahîm Halîl Yıldız ve hatin qetilkirin. Di wê êrîşê de Ferît Şenyaşar birîndar bûbû.

Di 21ê Tebaxa 2022an de Malbata Şenyaşaran li ber Edliyeya Rihayê Nobeta Edaletê domandin ku di 9ê Adara 2021an de dest pê kiribûn. Ew roja 533yemîn a nobetê bû. Rûniştina malbatê ya li ber deriyê edliyeyê ji 8ê Tebaxê û vir ve "bi biryara Serdozgeriyê" ji aliyê polîsan ve tê astengkirin.

Di roja 533yemîn a nobeta edaletê de malbata Şenyaşaran ketin edliyeyê û xwestin bi dozgerê dozê re hevdîtîne pêk bînin. Dozger tevî ku li dozgeriyê bû jî nexwest bi malbatê re hevdîtîne bike; Malbatê jî li qada bisî ya li ber deriyê edliyeyê dest bi rûniştîna kirin. Tevî ku polîsan bi hinceta biryara dozgeriyê xwest rûniştina malbatê asteng bike jî Emîne Şenyaşar rûniştina xwe berdewam kir. Li ser vê yekê polîsan dest danîn ser mîndera ku Emîne Şenyaşar lê rûniştibû. Piştî wê dayik û kurê wê ji aliyê bi dehan polîsan ve hatin dorpêçkirin.

Polîsan hewl da ku rojnamegeran asteng bikin ku dixwazin astengkirina nobeta edaletê bikin nûçe. Polîsan nasnameya nûçegihanê Ajansa Mezopotamyayê (MA) Emrullah Acar hildan û ji Nihêrîna Agahiyên Giştî (GBT) derbas kirin. Polîsan ji bo ku Acar wêneyan nekişîne, jê xwest ku çenteyê xwe vala bike. Acar tevî astengiyê jî kişandina dîmenan berdewam kir.

### **24ê Tebaxê, 2022**

#### **Dadgeha Makezagonê: Mafê jiyane yê Mehmet Ogru yê ku li Girtîgeha Silîfkeyê jiyana xwe ji dest da hat bînpêkirin.**

Dadgeha Makezagonê (AYM) biryar da ku mafê jiyane yê girtiyê nexweşê giran Mehmet Ogru ku di 19ê Tebaxa 2017an de jiyana xwe ji dest da, hatiye bînpêkirin û divê tazmînata malbata wî bê dayîn.

Mehmet Ogru di 21ê Mijdara 2016an de li Mêrsînê bi îdfiya "endamtîya rêxistina terorê" û "peydakirina madeyên xeternak a bê destûr" hat girtin û şandin Girtîgeha Girtî ya Tîpa Myê ya Silîfkeyê.

Di 23ê Çileyê 2017an de li Ogruyê ku dema ket girtîgehê rewşa tenduristîya wî baş bû, teşhîsa "Farenjîta akût" hatibû dayîn. Di 30ê Çileyê 2017an de bi lezgînî ew rakirin Nexweşxaneyê Dewletê ya Silîfkeyê. Hat dîtin ku xwînarîya mejiyê lê peyda bûye. Mehekê li nexweşxaneyê ma. Di 8ê Sibata 2017an de ji nexweşxaneyê hat derxistin û şandin girtîgehê. Lê belê, ji ber xwînarîya mejiyê, felc li Ogru ketibû û di girtîgehê de jiyana xwe felcbûyî berdewam dikir. Li Mehmet Ogru di 13ê Adarê de teşhîsa nexweşîya reflûyê, di 8ê Gulanê de ya enfeksiyona rêya hilmijê ya akût û di 12ê Hezîranê de jî ji aliyê doktorê girtîgehê ve teşhîsa zatûreyê hat danîn. Ogruyê ku ji ber van nexweşîyan sewqî Nexweşxaneyê Zanîngeha Mêrsînê hat kirin û teşhîsa "pençeşêra pişikê" lê hat danîn dîsa şandin girtîgehê.

Ji ber ku rewşa wî giran bû bavê wî di 2yê Tebaxa 2017an de ji Serdozgeriya Komarê ya Silîfkeyê re daxwazname nivîsand. Ragihand ku pençeşêra kurê wî li laşê wî belav bûye û ji bo mudaxeleya emeliyatê bi



derengî ketiye, kurê wî li revîra Girtîgeha Girtî ya Mêrsînê tê ragirtin û got ku dema cara dawîn çûye hevdîtina girtî kurê wî nikarî biaxive. Bavê wî di daxwaznameyê de daxwaz kir ku ji ber vê rewşa wî ya giran a tenduristiyê înfaza wî bêyî ku li benda rapora heyetê bimînin were bipaşxistin.

Ogru di 19ê Tebaxa 2017an de ji ber nexweşiya pençeşêrê li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Wezaretê Edaletê ya ku di çarçoveya lêpîrsînê de nêrîna wê hat pîrsîn, diyar kir ku di mirina Ogru de îhmal tune ye. Serdozgeriya Komarê ya Sîlîfkeyê ku lêpîrsîn da meşandin di 7ê Adara 2018an da bi hinceta "Di mirina Ogru de sûcê kesî tune ye" biryara neşopandinê da.

Îtiraza fermî ya bavê Ogru ya li dijî biryara neşopandinê ji aliyê 2yemîn Dadgeha Cezayê Sulhê ya Mêrsînê ve di 6ê Tîrmeha 2018an de hatibû redkirin. Malbatê di 10ê Tebaxa 2018an de serî li Dadgeha Makezagonê dabû. Dadgeha Makezagonê di 16ê Hezîrana 2022an de biryar da ku "Qedexeya muameleya li dijî rûmeta mirovan" û "mafê jiyane" ji aliyê maddî û qanûnî ve hatiye binpêkirin. Her wiha dadgehê biryar da ku 50 hezar TL tazminata manewî ji malbatê re bê dayîn. Biryara bi hincet di 24ê Tebaxa 2022an de hat ragihandin.

### **Dadgeha Makezagonê serîlêdana malbata Abdullah Comert ê di berxwedana Geziyê de hat qetilkirin red kir.**

Dadgeha Makezagonê (AYM) serîlêdana der heq binpêkirina mafê jiyane ya Abdullah Comert ê di dema berxwedana Geziyê ya di sala 2013an de ji aliyê polîsan ve bi bombeya gazê hat qetilkirin, red kir. Di biryarê de hat gotin ku "Lêpîrsînek bi bandor hat kirin û berpirsyarê mirinê hat teşxîskirin û cezayeke hevseng û berterefker lê hat birîn."

Abdullah Cömert di 2ê Hezîrana 2013an de li navçeya Antakyayê ya Hatayê ji ber bombeya gaza îsotê li serê wî ketibû jiyana xwe ji dest da. Polîs Ahmet Kuş hat darizandin û 6 sal û 10 meh û 15 roj cezayê girtîgehê lê hat birîn. Fermanarên ku di roja mirina Abdullah Comert de fermana bikaranîna gazê dabû, di dosyeyê de cih negirtin û der barê wan de tu doz nehat vekirin.

## **25ê Tebaxê, 2022**

### **Stranbêja muzîka popê Gulşen hat girtin**

Serdozgeriya Komarê ya Stenbolê der barê stranbêja muzîka popê Gulşenê, ji ber gotinên wê yên di der heqê xwendekarên lîseyên Îmam Hatîbê kiribû, bi îdiaya ku "gel tehrîkî kîn û dijminatîyê kiriye" lêpîrsîn da destpêkirin. Stranbêja ku sewqî Edliyeya Cezayê Sulhê hat kirin danê êvarê ji aliyê dadgehê ve hat girtin û birin Girtîgeha Jinan a Girtî ya Bakirkoyê.

Şîroveya Gulşenê ku di konsera xwe ya 4 meh berê de kiribû di 24ê Tebaxa 2022an de li ser medyaya civakî hat parvekirin û bi lez belav bû. Di qeyda vîdeoya ku hat parvekirin de, dihat bihîstin ku Gulşen li ser sehnê henek dikir û digot, "Li lîseyê Îmam Hatîbê xwendîye, feraseta wî ji wir tê".

Li ser medyaya civakî li hember stranbêjê tehdîd, bertek û sûcdarkirîya ku heqaret li xwendekar û mezûnên Lîseyên Îmam Hatîbê kiriye her çû zêde bû, ji alîkî jî Alîkarê Serokê Giştî yê AKPê û Berdevkê Partiyê Omer Çelîk, Alîkarê Serokê Giştî yê AKPê Numan Kurtulmuş, Şewirmendê Serokê Giştî Mehmet Uçum, Serokê Karên Diyanetê Alî Erbaş Gulşen şermezar kir û wek hedef nîşan da.

Hunermenda ku 4 rojan di girtîgehê de ma, roja Duşemê di 29ê Tebaxa 2022an de "bi şertê kontrola edlî ku ji malê dernekeve" hat berdan.

Di Lîseyên Îmam Hatîbê de li gel mufredatên dibistana navîn û amadehîyê dersên pîşeyî yên girêdayî dîne Îslamê tîn dayîn û li ser esasên sunî perwerdehiya olî tê dayîn.



Xala 4emîn a Qanûna Tevhid-î Tedrisatê (Qanûna Yekîtiya Hîndekarîyê) ku piştî damezrandina Komarê hat derxistin, destnîşan kir ku li dû girtina medreseyan, ji bo gihandina mele û xatibên xizmetên olî pêk bînin dibistanên cuda bînin vekirin. Ev dibistanên ku di qanûnê de hatine diyarkirin di sala 1924an de li 29 navendan bi navê Dibistanên Îmam Hatîbê hatin vekirin. Di sala hîndekarîyê ya 2010-2011an de bi giştî 495 Lîseyên Îmam Hatîbê di fealîyetê de bûn ; Îro hejmara van dibistanan hezar û 687 e.

Serokomar ji mezûnê Îmam Hatîbê ye û mezûnên dibistanên Îmam Hatîbê û Fakulteyên Îlahiyatê di gelek meqamên sereke yê îdarî de cih digirin; ji Karên Navxweyî heta Maliyeyê, heta Wezareta Karên Derveyî, ji xebatên Perwerdehiya Neteweyî bigire heta hêzên ewlehîyê. Vê yekê bandoreke mezin kir li bertek û nîqaşên der heq girtina Gulşenê de.

## **26ê Tebaxê, 2022**

### **Saziya Tiba Edlî (ATK) ji ber wergêrê Kurdî tunebû li girtiya 80 salî Makbule Ozer guhdarî nekir.**

Makbule Ozer a 80 salî ku ji sedî 53 astengdar û nexweşa giran e, li Girtîgeha Ewlekariya Bilind a Wanê girtî ye, Ew di 24ê Tebaxa 2022an de sewqî Saziya Tiba Edlî ya Stenbolê hat kirin.

Parêzera wê Dîlan Kunt, diyar kir ku Saziya Tiba Edlî bi hinceta ku "Wergerê Kurdî tune ye." guh neda gazinên Ozer ên derbarê tenduristîyê wê ku girêdayî temen in. Ozer dîsa şandin Wanê. Li ser vê nûçeyê Wezareta Dadê di 27ê Tebaxa 2022an de di daxuyaniyekê de îdia kiribû ku di navbera Makbule Ozer û bijîşkan de ti pirsgirêkeke pêwendiyê nîne û wê daxwaza wergêra kurdî jî nekiriye. Ji aliyê din ve parêzera wê diyar kir ku Makbule Ozer bi qasî ku bêje "Ji min re wergêrêkê bînin" jî bi Tirkî nizane û tenê bi kurdî diaxive û jixwe di vê rewşê de divê bangî tercumanan bikin.

Makbule Ozer di sala 2018an de li navçeya Edremîta Wanê bi îdiaya "alîkariya rêxistina terorê kiriye" hat darizandin. Darizandin 4 salan dom kir. Di encamê de sêncdar hat dîtin û 2 sal û mehek cezayê girtîgehê lê hat birîn û di 9ê Gulanê de hat girtin.

### **Di der heq hevberdana parlamentera AKPê Zehra Taşkesenlioglu weşana 74 nûçeyan hat qedexekirin**

Di derbarê hevberdana Parlamentera AKPê ya Erziromê Zehra Taşkesenlioglu û rektorê berê yê Zanîngeha Sazîya Hewayî ya Tirk û bernamzetê parlementeriyê yê AKPê Prof. Dr Unsal Ban de ku navê wan di nûçeyên gendeliyê de cih digirin biryara qedexekirina gihandina nûçeyê hat dayîn. Taşkesenlioglu doza hevberdanê li hevjinê xwe kir û wekî tezmînat daxwaza 70 milyon lireyî kir. Li ser serîlêdana Taşkesenlioglu, Dadgeha Cezayê Sulhê ya Golbaşiyê weşana hemû nûçeyên der barê îfadeyên Unsal Ban ên der barê hevjinê wî Taşkesenlioglu û îdiayên wî yê der barê mal û milkê wî de bi hinceta ku mafên wê yê şexsî bin pê dibin qedexe kir. Dadgehê her wiha nûçeyên derbarê qedexekirina weşana nûçeyên navborî jî qedexekirin. Bi vî awayî di nav 74 nûçeyên cuda yê ku hatibûn astengkirin de, nûçeyên qedexekirina gihandina nûçeyên ku berê hatibûn weşandin jî cih girtin.

Navê Zehra Taşkesenlioglu di îdiayên bertîl û bertîlxwarinê de cih digire ku li ser Twittera Sedat Peker tîne weşandin. Sedat Peker bi sêncên curbecur ve tê tawanbarkirin û ew gavê li Mîrektiyên Yekbûyî yê Ereban dijî. Peker îdia kir ku Serokê berê yê Lijneya Piyaseyên Sermayeyê Alî Fuat Taşkesenlioglu û xwişka wî Zehra Taşkesenlioglu ji xwedîya Holdînga Marka Yatırım Mine Tozlu Sineren 12 milyon TL bertîl xwestine da ku pirsgirêkên şîrketa wê yê tîkîlî kirarîyên borsayê çareser bikin. Peker ji bo van îdiayên xwe piştrast bike hin jêvnişînên Whatsappê û belge weşandin. Mine Tozlu Sineren di bernamneyê nûçeyî ku di 27ê Tebaxa 2022an de beşdar bû de ev îdia piştrast kir. Tê îdiakirin ku serokê berê yê Lijneya Piyaseyên Sermayeyê Alî Fuat Taşkesenlioglu di heyama xwe ya 4 salan de bi giştî 180 milyon dolar bertîl wergirtiye.



**29ê Tebaxê, 2022**

**Şaredariya Gungorenê ya AKPyî, tevî nerazîbûnên niştecihan, li Tozkoparanê ji bo veguherîna bajariyê dest bi tehlîyeya bizorê kir.**

Ekîbên hilweşandinê yê şaredariyê yê girêdayî Gungorena navçeya Stenbolê di 29ê Tebaxa 2022an de saet di 5.00an de bi TOMA û amûrên însaetê bi tevlêbûna polîsan ketin Tozkoparanê. Tevî berxwedana niştecihan jî hilweşandina hin xaniyên vala dest pê kir. Li Taxa Tozkoparanê ku nêzî hezar û 500 polîs ketin hundir, ketin û derketina kolanan hatin girtin.

Ketina rojnamegeran a taxê hat astengkirin. Parêzerê gelê taxê Onur Cîngil li ser hesabê xwe yê medyaya civakî destnîşan kir ku destûr nayê dayîn ku têkeve taxê. Cîngil da zanîn ku li ser radyoyên polîsan daxuyanî hat dayîn ku "ketina parêzer, endamên çapemeniyê û siyasetmedaran a taxê nayê qebûlkin."

Taxên Mehmet Nesîh Ozmen û Tozkoparanê di sala 2006an de wekî qadên veguherîna bajariyê û di sala 2013an de jî wekî herêmên birîsk hatin îlankirin. Dûvre ev tax bi Biryarnameya Serokomariyê ya ku di 21ê Nîsana 2020an da di Rojnameya Fermî de hat weşandin wek herêmên afatê hatin îlankirin. Teblîgat ji niştecihan re hatin şandin ku 'malên xwe vala bikin'. Ev mijar çû darêzgêriyê; Dadgeha Îdarî ya 10emîn a Stenbolê biryara rawestandina înfaza tehlîye û hilweşandinê da.

Di destpêka Hezîrana 2020an de, biryara rawestandina înfazê hate rakirin; Di 23ê Hezîranê de li Taxên Mehmet Nesîh Ozmen û Tozkoparanê xizmetguzariya kareba, av û gaza xwezayî qut bû.

Di Tîrmeha 2021an de di encama têkoşîna hiqûqî ya şênîyên taxê de Şuraya Dewletê der barê biryara îlankirina herêmê ya wekî herêma birîsk biryara rawestandina înfazê da. Lê belê şaredariya Gungorenê dest bi hilweşandinê kir.

**Hestiyên Hakan Arslan ê li Sûra Amedê jiyana xwe ji dest da, piştî 7 salan di tûr de hatin teslîmkirin.**

Hestiyên Hakan Arslan ê ku di dema qedexeya derketina derve ya di 2ê Kanûna 2015an de li navçeya Sûrê ya Amedê hatibû îlankirin de di pevçûnan de jiyana xwe ji dest da, piştî 7 salan di tûr de radestî bavê wî kirin.

Di 7ê Sibata 2021an de li Taxa Hasirliya navçeya Sûrê li herêma navbera Dêra Katolîk û Mescida Hasirliyê di kolandina restorasyonê de hestiyên mirovan hatibûn dîtin. Li ser vê nûçeyê malbata wî serî li Serdozgeriya Komarê ya Amedê da û ragihand ku li gorî agahiyan Hakan Arslan di 22ê Çileyê 2016an de jiyana xwe ji dest da û li kêleka Mizgefta Hasirliyê hat definkirin. Di encama analîza DNA ya ku ji aliyê Saziya Tiba Edlî ve hat kirin de, di 18ê Mijdara 2021an de hat tespîtkirin ku hestiyên di kolandinê de hatine dîtin aîdî Hakan Arslan in.

Li ser agahîdana Dozgeriyê Alî Riza Arslan ji bo cenazeyê kurê xwe bigire ji bajarê xwe Erziromê hat Amedê. Di 29ê Tebaxa 2022an de ji bo ku muameleyên kaxizên fermî temam bike bi fikra ku dê cenaze ji morga Tipa Edlî bê teslîmkirin dageriya Edliyeya Amedê. Karmendê ku ew li dadgehê dît, ew bir odeya xwe. Tûrê ku hestiyên kurê wî tê de bûn ji dolabê derxist û da Alî Riza Arslan. Baroya Amedê diyar kir ku li gorî zagonan divê hestî di tabûtê de bûn teslîmkirin û pêvajoya teslîmkirinê ya bi vî rengî şermezar kir û xwest ku der barê dozgerê berpîrsyar de lêpîrsîn bê destpêkin.

**Walîtiya Mûglayê Festîvala MilyonFest Fethiyeyê, Walîtiya Ceyhanê konsera İlkey Akkayayê betal kir**

Yek ji mezintirîn mîhrîcanên muzîkê yê li Tirkiyeyê ku îsal di navbera 1-4ê îlonê de cara duyemîn dê bihata lidarxistin, Milyon Fest Fethiye ji aliyê Walîtiya Muğlayê ve di 23ê Tebaxa 2022an de hat betalkirin.

Li aliyê din Qeymeqamiya Ceyhanê ya Edeneyê konsera İlkey Akkaya ya ku dê di Cejna Serkeftinê; 30ê Tebaxa 2022an de pêk bihata qedexa kir.



Şaredarê Fethiyeyê Alim Karaca bertek nîşanî biryara Walîtiya Muglayê da û wiha got: "Ti hincetên biryara ku hatiye dayîn tune ye. Konserên kesên nêzî wan nayên betalkirin."

Di qerara betalkirinê ya Walîtiya Muglayê da hat diyarkirin ku Plaja Giştî ya Înlaceyê ku wê mihrîcan lê bihata lidarxistin Qada Taybet a Parastina Hawirdorê (ÖÇK) û qada arkeolojiyê ye û hat destnîşankirin ku divê ji Midûriyeta Bajêr a Hawirdor, Bajarvanî û Guherîna Avhewayê destûr bê girtin.

Şaredariya Ceyhanê ragihand ku Qeymeqamiya Ceyhanê ewlekariya giştî, nîzama giştî û asayîş weke sedema qedexeyê nîşan da û ji xelkê Ceyhanê lêborîn xwest.

Îlkay Akkaya di 31ê Tebaxa 2022an de ragihandibû ku konsera ku ew ê di 24ê Îlona 2022an de li Şanoya Amfî ya Mêrdînê ya Kamor Millet Bahçesiye bide jî betal bûye. Akkaya destnîşan kir ku di teblîxa betalkirina Walîtiya Mêrdînê de hincet wisa hatiye destnîşandan: "Hinek endamên ekîba hunermendê çalakîyên ku pesnê serokê rêxistina terorê PKK/KCKyê dane".

Hin festîval û konserên ku hatine betalkirin ev in:

- 1- Konsera Koma ji Koreya Başûr Mirae (Festîvala Rêya Çandê ya Paytextê, 15ê Gulana 2022an)
- 2- Konsera Metin-Kemal Kahraman (Muş, 17ê Gulana 2022an)
- 3- Konsera Niyazi Koyuncu ya Pendikê (Stenbol, 23ê Gulana 2022an)
- 4- Festîvala Biharê ya ODTUyê (25ê Gulana 2022an)
- 5- Festîvala Biharê ya Zanîngeha Teknikî ya Yıldızê (25ê Gulana 2022an)
- 6- Konserên Apolas Lermi (Denizli 29ê Gulana, Stenbol Bostancı 11ê Hezîranê, Giresun 16ê Tîrmehê û Sakarya 31ê Tîrmeha 2022an)
- 7- Konsera Melek Mossoyê (Isparta – 3ê Hezîrana 2022an)
- 8- Konserên Aynur Doganê (Kocaeli 20ê Gulana 2022an, Bursa 26ê Gulana 2022an)
- 9- Anadolu Fest (27ê Gulana 2022an)
- 10- Konsera Ara Malikian (Festîvala Rêya Çandî ya Paytextê, 11ê Hezîranê)
- 11- Festîvala Ekolojiyê ya Kazdagiyê (6ê Tîrmehê)
- 12- Festîvala Çand û Xwezayê ya Munzurê (Dêrsim, 21ê Tîrmeha 2022an)
- 13- Festîvala Muzîkê ya Kozluya Zonguldakê (25ê Tîrmehê)
- 14- Anadolu Fest (10ê Tebaxa 2022an)
- 15- Panayîra Gokçedayê ya Meryem Anayê (12ê Tebaxa 2022an)

### **30ê Tebaxê, 2022**

**Polîsan êrîşî mamosteyan kir ku xwestin li Enqereyê xwepêşandanê lidarbixin; 2 parêzer û 4 mamoste hatin binçavkirin**

Mamosteyên Sektora Taybet ên li Enqereyê hatin cem hev, ji bo meaşê bingehîn û mafên şexsî, li Navenda Perwerde û Çandê ya TMMOBê hatin civîyan. Polîsan bi zorê mamosteyên ku xwest ber Midûriyeta Perwerdehiya Neteweyî ve bimeşin asteng kirin.

**Polîsan mudaxeleyî Dayikên Şemiyê kir, 14 kes hatin binçavkirin**

Dayikên/Mirovên Şemiyê bi wesîleya 30ê Tebaxê Roja Windakirinan a Cîhanê li Goristana Altınşehirê ya Bêkesan hatin cem hev. Polîsan mudaxeleyî komê kir ku xwestin daxuyaniya çapemeniyê bidin. Dayikên Şemiyê li ser hesabê xwe yê fermî yê Twitterê diyar kirin ku wan Maside Ocak, Huseyîn Ocak, Alî Ocak, Besna Tosun, Hanim Tosun, Hasan Karakoç, Hanîfe Yıldız, Gulseren Yolerî, Huseyîn Aygul, Ferît Barut û 4 parêzvanên mafên mirovan binçav kirin. 14 kesên hatibûn binçavkirin piştî ku îfade dan serbest hatin berdan.



**31ê Tebaxê, 2022**

**Li Mêrdîn û Colemêrgê hemû mitîng, xwepêşandan, daxuyaniyên çapemeniyê, konser, mîhrîcan, şano û çalakîyên bi vî rengî ji bo 15 rojan hatin qedexekirin.**

Bi biryarên walîtiyên Colemêrg û Mêrdînê, her cure çalakîyên wekî mitîng, xwepêşandan, çalakiya rûniştinê, vegirtina konan, daxuyaniyên çapemeniyê, vekirina standan, konser, mîhrîcan, şano, skeç, pêşandana sînevîzyonê û belavkirina belavokan, ji 1'ê Îlonê heta 15'ê Îlonê hat qedexekirin.

Walîtiya Colemêrgê hinceta biryarê wiha nixand: "Taybetmendiyên bîngehîn ên Komarê, yekparebûna dewlet û neteweyî, ewlekariya neteweyî, nîzama giştî, pêşîlêgirtina sûcan, parastina maf û azadiyên kesên din, parastina tenduristiya giştî, pêşîlêgirtina belavbûna şewba coronavirusê, pêşîlêgirtina provokasyonên muhtemel û bûyerên muhtemel ên civakî". Walîtiya Mêrdînê di hinceta qedexeyê de bal kişand ser vê yekê ku bi varyanta omicronê weqayên coronayê (covid19) zêde bûne û wiha got: "Di çalakîyên ku ji aliyê rêxistinê sivil, an jî kesên rastîn an hikmî tîn lidarxistin de ku li navendên kirîyarîyê, derdora avahî û saziyên ku xizmetguzarîya gel dîkin, qadên giştî, li park û baxçeyên bêhnvedanê pêk tînin dibe ku ji bo kesên ku van çalakîyan li dar dixin û kesên li derdorê ji aliyê ewlehîyê ve xetere derkevin holê. Dema çalakîyan dibe ku (di navbera hêzên ewlehîyê û çalakvanan/ hemwelatî û çalakvanan de) bûyerên nexweş pêk werin û parastina sazûmana giştî û maf û azadiyan têkeve xetere ye.